Welat
68
01 /11/ 2019
Çandî - Giştî - Serbixwe

# HERÊMA BI EWLEH E, AN DOJEH E !



Çîçek...Gula Hebûnê

Welat

# PEYVA WELAT

*Kovara* **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

*Sernivîser:*
**Aras Yûsiv**

*Desteya rêvebir:*
**Imran Yûsiv**

*Dizayner:*
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

## Herêma bi Ewleh e, an Dojeh e !

**Desteya sernivîs**



*Li jêr armanca pêkanîna devereke bi ewleh, û parastina ewlehîya netewî ya Turkiriyê, dewleta Turk du êrîş dan ser rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyê û beşek mezin ji xaka wê dagîr kir.*
*Ev êrîşên bêbext di çarçoveya rêkeftin û bazarên ku Turkiyê bi Rûs û Emerîkiyan re girêdan da pêkanîn. Û di encamê de, destpêkê Efrînê dagîr kir, piştre di bin navê (Kaniya Aştîyê) da deverên Serê Kaniyê û Girê Sipî dagîr kirin.*
*Gelo artêşa Tirk û çekdarên bi ser wê û hemahengiya sûrî ve ku navê (artêşa netewî) li xwe dikin çi ewlehî bi xwe re anîne van deveran ? Bersiva vê yekê ji her kesî re diyar bûye, lê mixabin gelek dewlet û kes ji bo berjewindiyên xwe ên bi dewleta Turkiyê re çav, guh û devên xwe li ber rastiyê girtine.*
*Bi derbasbûna artêşa Turk û çeteyên bi ser wê re û dagîrkirina wan ji Efrînê re rewşa ewlehî li wê deverê bi carekê re têkçû, 400 hezar ji kurdên Efrînê ji xaka xwe hatin derxistin û îro roj li derveyî devera xwe penaber bûne. Ên mayî jî li jêr desthilatdariya çekdarên islama radîkal da û hişmendiya wan ya terrorist û paşketî da di nav rewşeke pir xirab da jiyan dikin. Dewleta turk Efrîn bi destê van terorîstên nijadperest da berdaye ku çi kiryareke hovane û xirab bi serê gelê Efrînê da bînin bêyî ku ti zagon hebe ku wan siza bike û rê li ber kiryarên wan bigire. Di ber van tawanên hovane re guhertineke demografîk ya berfireh hate kirin û bi hezaran welatiyên sûrî yên bi fikir û ramana xwe alîgirê turkiyê ne li Efrînê hatin bi cih kirin û mal û mewdanên kurdan li wan hatin parkirin. Efrîna ku mîna bûkeke bedew û ciwan bû kirin warê terorîstên rîh gemar û qirêj û di nava tarîtî û reşbûna hizira dagîrkeran ya qirêj û kîndariya wan da xeniqadin û ti bingeha jiyanê lê neheştin.*
*Îro roj, heman rewş li Serê Kaniyê û Girê Sipî dubare dibe, û heman kiryarên hovane li ser gelê kurd û gelê deverê têne bi kar anîn, lê vê carê cîhan bêdeng nema û ew armancên ku Erdogan bi wan cîhan xapandibû dema ku Efrîn dagîr kir, êdî nema dihêne bawer kirin. û ew tawan û komkujiyên ku li Efrînê hatin kirin û hatin nixumandin, êdî li Serê Kaniyê hatin eşkerekirin û şermezarkirin. Û Erdogan li pêşberî hemû cîhanê rûreş derket, û ji her kesî re hate diyarkirin ku Erdogan bi behaneya pêkanîna devera bi ewleh dixwaze kurdan qir bike û wan ji devera wan derxîne.*
*Di wê dema ku em tê de dagîrkeriya Turkiyê şermezar dikin, em dibêjin ku ew tawnên ku artêşa turk û çeteyên bi ser ve ku li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî kirine tawanên li dijî mirovahiyê ne û divê tawanbar bêne dadgehkirin. Û em di wê baweriyê ku dagîrker dê nikaribin vîna gelê me bişkînin û dê rojek were ku bi rûreşî ji xaka me ya pîroz derkevin.*

تبنّى ثورة
adopt a revolution



# ÇAWA ZAROKA TE XWE DIXAPÎNE?

Adil Ibrahîm

Zaroka te ji bo ku xwe ji şaşiyên xwe rizgar bike yan jî ji bo ku hemahengiya xwe ya derûnî vegerîne, berê xwe dide xwexapandinê. Pêwîst e tu jî cûreyên xapên ku zaroka te xwe dispêre wan binase û tu alîkariya wî bikî da ku xwe ji pirsgirêkên xwe rizgar bike û nema xwe bispêre vî rêbazî (rêbazê xwexapandinê).

Xwexapandin rêbazek ji rêbazên vegerandina hemahengiya derûnî ye, mirov bi rêya wê dixwaze du armancan pêk bîne; yekem, xwe ji pêdiviyên rewşeke tengezar ku tê re derbas dibe rizgar bike û Duyem, bi rêya behaneyan, revîna xwe ji wê rewşa ku tê re derbas dibe rewa bike. Bi vî awayî derûniya wî ber bi hedariyê ve diçe.

**Çima zarok xwe dixapîne?**

**Xapandinên derûnî yên nehestiyar ên ku zarok xwe dispêre wan gelek in; hin ji wan ev in:**

1. **Qerebûkirin:**

Ev peyv du wateyan dide; ya yekê, zarok ji ber qelsiya wî di pêkanîna handerekê de, berê xwe dide handereke din, mînak zaroka ku di lîstina gogê de qels be, vê qelsiyê bi jêhatbûna xwe ya ramanî qerebû dike. Ev cûre qerebû, tu xwexapandin tê de nîne ji ber ku qerebûyeke bizanebûn û rasteqîn e. Ya duyan, dema ku zarok di karekî de bi ser nakeve yan jî astengî li hemberî pêkanîna xweseka wî derdikevin, ji dêvla ku ev zarok gazinan ji xwe bike, berê van gazinan dide kesekî yan jî tiştekî ku tu têkiliya wî bi vê babetê re nîne.

2. **Rewakirina binkeftinên xwe (behanekirin):**

Mebest jê ew e ku zarok hewil dide da ku binkeftinên xwe li dibistan, mal, lîstikgehê û hwd rewa bike û li ser dîdtina sedemine ku binkeftina wî rewa dikin –ku di baweriya wî de ev sedem rast in- rijd be. Dibe ku –weke mînak- ev zarok hemû sedemên binkeftina xwe li çewsandin û zordariya ku kesên din der heqê wî de dikin, vegerîne. Bi vî awayî ev zarok vedigere malê û ji dayîka xwe re diyar dike ku sedemên binkeftina wî ew in ku mamosteyê wî jê hez nake û ji hevalên wî bêhtir hez dike û her tim zordarî der heqê wî de pêk tê. Bi heman awayî binkeftina xwe ya li hemberî hevalên xwe li îstikgehê, bi nepeydabûna derfeta guncav ve girê dide. Her wiha dibe ku binkeftina xwe ya di ezmûnan de pispêre zehmetiya pirsên ezmûnê… yanî ev zarok her tim sedeman ji binkeftina xwe re dibîne û bi vî awayî baweriya xwe bi xwe diparêze û peytîbûna wî ya derûnî kêm dibe. Lê hêja ye bihête gotin ku ev rewakirina binkeftinan dema ku zêde bibe, bandorên wê yên neyînî li ser derûniyê hene ji ber ku êdî mirov nikare li hemberî arîşeyên xwe bi erênî raweste.

3. **Fêlên derûnî yên xwenexweşkirinê:**

Zarok bi hukmê têkiliya wan bi mezinan re tê digihêjin ku nexweşiyên mîna serêşê û verîşandinê, dihêle kesên derdorê bêhtir bala xwe bidinê; ji lew re zarok bizanebûn yan jî nebizanebûn wan nîşaneyên nexweşiyê digirin xwe. Dibe ku armanca zarokê ji vê yekê ew be ku xwe ji erkekî ku jê tê xwestin, rizgar bike; mînak: Zaroka ku ji ber hin sedeman naxwaze biçe dibistanê, dibe ku xwe nexweş bike û bibêje serê min diêşe. Rastî tevî ku ev serêşî tu bingeheke jîndetî jê re nîne jî, lê zarok pê dihise ku rastî serê wî diêşe û ji ber vê serêşiyê astengiyan dikşîne. Dibe ku ew pirsgirêk li dibistanê –weke mînak- ev bin: Mamoste wî ji pêş hevalên wî ve kêm dike, mamoste lê dixe, ew nikare bighêje asta xwendinê ya guncav… Jixwe çareseriya tekane ji vê nexweşiyê re, ew e ku pirsgirêkên ku zarok di dibistanê de jiyan dike, werin çareserkirin.

4. **Paşvezivirîn:**

Dema ku zarok nikaribe tu çareyê ji astengiya ku li pêşberî wî derketiye re, peyda bike, xwe

vedigerîne qonaxeke borî ji jiyana xwe ku tê de digrî û bi xwe de dimîzî ( yanî xwe ji nû ve biçûk dike). Ev dek xwedî sûdeke pir hindik e (tenê fişandineke derûnî ya demkî ye).

**Hin şîretên girîng di vê derbarê de:**

Pêwîst e were zanîn ku piraniya zarokên ku xwe dispêrin fêlên derûnî û xwe dixapînin, ne encamên demeke borî ne ku çareserkirina wê ne pêkan e, lê belê pirê caran ev zarok encamên jîngeha ku ev zarok tê de jiyan dikin.

Faktorên herî girîng di vê jîngehê de, malbat û dibistan in, ji lew re erkekî mezin dikeve ser pişta dê û bavan û mamosteyan da ku alîkariya van zarokan bikin. Em ê niha hin şîretan bikin da ku zarok ji van dekan werin dûrxistin:

1. Dema ku zarok fêlên derûnî bi awayekî zêde bi kar bîne, pêwîst e dê û bav hewil bidin ku sedemên van fêlan nas bikin; ji ber ku naskirina sedemên reftarê wî, ji reftar bi xwe jî girîngtir e. ji ber vê yekê pêwîst e dê û bav li pirsgirêk û sedemên hêvî û bêhêviyên wî bigerin. Paşê pêwîst e alîkariya wî bikin da ku rastiya tiştan nas bike û rêya serkeftina li hemberî pirsgirêkên wî yên rojane, nîşanî wî bidin.

2. Pêwîst e dê û bav, zarokên xwe fêr bikin da ku bi geşbînî rahêjin erkê xwe û li hemberî binkeftina xwe bi dilawerî rawestin û tevî ku bi tirs û lewaziyê dorpêçkirî ne jî lê gerek e karibin bi hemû erkên xwe rabin.

3. Pêwîst e dê û bav û mamoste bi demokrasî danûstandinê bi zarokê re bikin. Eger mamoste bixwaze bi erkê baş rabe, pêwîst e karînên xwendekar ên hizrî û jiyana wî ya derûnî û kêf û şînên wî nas bike. Gerek e zarok bav û mamosteyê xwe weke desthilatdarekî yan jî semboleke tirs û zordariyê nebîne. Ji bo pêkanîna vê yekê, ji dê, bav û mamosteyan tê xwestin ku danûstnandina wan bi zarokan re demokrasî be û dûrî fişar û tirsê be.

4. Bixwebawerî: Gerek e bi rêya damezirandina kesayeta zarokê, alîkariya wî were kirin da ku baweriya wî bi wî xurt bibe. Ev yek jî bi rêya destnîşankirina aliyên hêzdariyê li balê û bihêzkirina wan aliyan û destnîşankirina aliyên lewaziyê li balê û çareserkirina wan aliyan. Her çiqasî em derfetê zû li hemberî zarokê vekin da ku kar bike, bilîze û rikberiyê bi zarokên di temenê xwe de bike, ew qasî dê karibe li hemberî pirsgirêkên xwe raweste û çareseriyan ji wan re bibîne.

Ez ê li van xalan vê yekê jî zêde bikim: Pêwîst e em ji zarokê zêdeyî karîna wî nexwazin û eger di pêkanîna daxwaza me de dereng ma, gerek e em bêhina xwe lê fereh bikin û dema jê re guncav bidinê da ku karibe serkeftinê pêk bîne. Bi vî awayî dê baweriya wî bi wî xurttir bibe, bi taybet dema ku em jê re bidin xuyakirin ku karê ku wî kiriye pir girîng e.



# SALNAMEYA KURDÎ

Zîyad Hisên

Ji şeveqavêtina dîrokê ve gelên dêrîn ên ku li ser rûyê zemînê jîyane ji bo ku çaxên kar û barên xwe destnîşan bikin, demên xwe ji hev veqetandine û nav li wan kirine. Mebest ji wê veqetandinê ew bû ku sal, meh û rojê ji hev nas bikin û li gor wê demên karên xwe nîşan bidin. Loma pêwîstî pê hebû ku her demek sînorê wê bê destnîşankirin û navekî taybet lê bihê kirin, encama vê yekê jî sazkirina salnameyê bû.

Salname pergaleka jimartina demê ye ji bo ku dîroka rojan li gor bûyerên civakî, olî, bazirganî û birêveberî bihên hesabkirin û birêkxistin. Di salnameyê da dem dihên veqetandin û nav li wan dihên kirin; roj, heftî, meh û sal. Wekî em dizanin salname dibe ku roj, meh û sala xwe li gor gera erdê li dora rokê yan jî li gor gera heyvê li dora erdê hesab bike.

Di dema îroyîn da piranîya cîhanê xwe dispêre Salnameya Zayînî. Salnameya Zayînî ku navê "Girîgorî" jî lê dihê kirin li ser destê keşeyekî romanî di sedsala 6an piştî zayînê da hatîye dahênan. Keşe banga wê yekê kir ku salnameya wan ji dêvla ku ji roja damezirandina Romayê ve bê hesibandin, ya baştir dît ku ji roja zayîna Hz. Îsa ve were hesibandin. Loma bangewazîya wî li cem gelî hate pejirandin, jixwe bi wê pejirandinê re salnameya zayînî wekî salnameya fermî di sala 532yan z da hat rûniştandin. Salnameya zayînê wisa navên mehên salê bi nav dike:

1-Yanayer 2-Febrayer 3-Mars 4-Aprêl 5-Mayo 6-Yonîyo 7-Yolîyo 8-Agustus 9-Sîptember 10-Oktober 11- November 12-Dîsember.

Kurdan jî mîna gelên din salnameya rokê bi kar anîye û nav jî li gorî heyamên xwe li werz, meh û rojan kirine. Heke Salnameya Zayînî ji zayîna Hz. Îsa dest pê dike, gelo ya kurdî kîjan salê dest pê dike? Der barê vê yekê da du nêrîn hene anku du dîrok dihên bikaranîn; yek ji wan dîroka berî 2719an e ku dîroka damezirandina împeretorîya Medan e, ya din jî dîroka berî 2631ê ye ku dîroka rûxandina împeretorîya Asûrî li ser destê Medan e.

Navên mehên kurdî ji herêmekê ber bi herêmeka din ve diguherin, her herêmekê mehên salê bi navine cuda destnîşan kirine, ev yek jî bûye sedem ku tevlihevî di navlêkirina mehan de derkeve. Her parçeyekî welêt rengekî bi kar tîne, ne tenê wisa, lê gihaştîye wê astê ku her dezgehek rengekî bi kar bîne.

Ji bo dîtina çareyekê ji vê arîşeyê re, çend dezgeh, sazî û alîyan hewlên xwe kirine ku rengekî rast û dirust ji navên mehan ra bipejirînin. Yek ji wan Enîstutûya Kurdî li Stenbolê bû ku şêwyekî xwerû kurdî ji bo mehan pejirandibû û di nivîsên xwe de weşand, navên mehên ku Enîstutûyê pejirandibûn wisa bûn: 1-Adar 2-Avrêl 3-Gulan 4-Pûşper 5-Tîrmeh 6-Gelawêj 7-Rezber 8-Kewçêr 9-Sermawez 10-Berfanbar 11-Rêbendan 12-Reşemî

Li rojavayê kurdistanê jî piştî ku rêveberîya wê ya xweser ava bû û jîyana fermî bi zimanê kurdî li wir vegeş bû, dezgeh û sazîyên rojnamegerî û birêveberî şêweyekî din ji




SALNAMEYA ROJA NU Kamuran Bedirxan 3 Gulan 1943

bilî yê Enîstutûyê pejirand û di çapemenîya xwe de bi kar anî, şêweyên ku li rojavayê Kurdistanê dihat bikaranîn wisa bû: 1-Adar 2-Nîsan 3-Gulan 4-Hezîran 5-Tîrmeh 6-Tebax 7-Îlon 8-Cotmeh 9-Mijdar 10-Kanûn 11-Çile 12-Sibat


Sadiq Uskan ku çend salan li dûv Payîzxêra xwe çû û navên mehên salê û heyamên ku di wan mehan de rû didin ji devên xelkê û ji pirtûkan kom kirîye, di dawîyê de gihaştîye encamekê û di berhema xwe de nîşan bi wê yekê kirîye ku meseleya mehên salê tevlihevîyê tîne der, loma hewlên xwe kirin da ku bigihêje şêweyê navên mehan ên herî berbelav. Şêweyê ku mamoste Uskan yê herî guncav dît wiha bû: 1-Adar 2-Nîsan 3-Gulan 4- Hezîran 5-Tîrmeh 6-Tebax 7-Îlûn 8-Çirîya Pêşîn 9-Çirîya Paşîn 10-Kanûna Pêşîn 11-Kanûna Paşîn 12-Sibat.

Komxebata Kurmancîyê ya ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê de û bi erêkirina 18 zimanzanan e, bi navê Rêbera Rastnivîsînê hatîye amadekirin. Vê komxebatê çend xêz ji xebata xwe ji navên mehan ra veqetandîye. Rêbera Rastnivîsînê heman şêweyê ku mamoste Sadiq Uskan pejirandîye ya ku berî çend xêzan hatine rêzkirin ya herî baş dît û wî şêweyî tercîh dike.

Ez dibêjim êdî çare ji tevlihevîya navên mehan ra hatîye dîtin û tu arîşe di vê biwarê de nemaye anku çawa Rêbera Rastnivîsînê li bakur û rojavayê welêt bingeh hatîye girtin êdî divê dezgeh û sazî tev vî şêweyê navên mehan bingeh bigirin. Der barê mijara destpêkirina sala kurdî de, nêrîna duyan anku dîroka 2631ê ya herî guncav e ku bihê tercîhkirin, sedem jî ew e ku Newroz wekî roja nû ya destpêka salê di vê dîrokê de pişkivîye, îcar ya herî guncaw ew e ku roja Newrozê û sala ku tê da çêbûye anku sala 612an berî zayînê wekî yekemîn roj û sal di salnameya kurdî da werin hesibandin.




ROJNAMA XANÊ
K 2607 | SÊŞEM | Z 1995
Avdar 21 | Şewal 20
Advar rohilati 8
cejna newe piroz be
Şevûroj dibin wek hev


• Sal: 2005
• Hicrî: 11 Sefer 1426
• Roj: 12 s. 09 d.
• Roja 80. a salê
• Rûmî: 7 Adar 1421
• Şev: 11 s. 51 d.
• Kurdî: 2705 Adar: 1
• Rojên mayî 285
• Çir. Paşiyê: 134
• D. rojê: 2 d. 39 sn.
ADAR
21
DUŞEM
Amed: Şeveq 3.52, Tav 5.15, Nîvro 11.33, Berêvar 14.57, Êvar 17.40, Şev 18.56
Enqere: Şeveq 4.18, Tav 5.44, Nîvro 12.03, Berêvar 15.26, Êvar 18.10, Şev 19.28
Sersala Kurdî (1 Adar 2705). Îro NEWROZ e. Cejna we pîroz be.
Roj dikeve Zayîça Mişkatê Hemel (21 Adar-20 Nîsan).
Dirêjahiya Şev û rojê dibin wek hev. Buhar dest pê dike.
Gotinê Pêşiyan
Ji piran pir,
ji hindikan hindik diçe.
Tiştonek
Şikefta reş,
tijî caniyên beş.
Çi ye?
Endîşe hesin jî zingarî dike; endîşe mirov dikuje.
ROJ - Salnameya Bidemjmêr 2005
PAUCHET



# CELADET HELBESTVANÊ SERDEMA NÛJEN E

Gulal Kasanî

Celadet Alî Bedirxan di 26`ê Meha Avrêlê sala 1893`an de li bajarê Stenbolê li Tirkiyeyê hatiye dinyayê û di 15`ê Meha Tîrmeha sala 1951`ê de li Şamê li gundê Heycanê ji sedema hiriftina bîra Qederê bi ser wî de, koça dawî kir.

Celadet Bedirxan hîna di esmanê Kurdistanê de mîna Stêra Gelawêjê diçirsîne.Em dikarin bibêjin ku Celadet ne tenê Zimanzan, şoreşvan, siyasetmedar, rewşenbîr û rojnameger bûye.

Her wiha Celadet xwediyê dilekî nazik û hestên bi kelecan û coşdar bûye. Ew hestdar û pêjinkerê kêşeya xwe bûye û tête zanîn ku ew helbestvanekî pêşeng bûye, wek yek ji hîmdarên helbesta kurdî ya nûjen tê hesibandin. Celadet bi şêweya klasîk jî helbestên xwe hûnadine.

Bedirxan bi hostayî helebst di tevna hizra xwe de rêstine, ji helbestên wî yên navdar ( Bêriya Botanê, Bilûra min, Were Dotmam, Strana Mirinê û Ala Kurdî û gelekên din.

Helbestvanê navdar Mîr Celadet Alî Bedirxan li ser Ala kurdî wiha dibêje:

Ala Kurdan di nav rok
Çi bedew û bi heybet
Bi çar reng î, rengên te
Çi delal û çi xweşkok
Xêzek kesk û xêzek sor
Nav sipî û nîvek zer
Keskesor e, bi roj e
Ev li jêr û ew li jor.

Di helbesta Bêriya Botan de, ku ji giyanê Şêx Evdirehmanê Garisî * re hatiye diyarîkirin, Celadet Bedirxan dibêje:

Kanî Derwêş ka Herekol, ka Kepir
Ka zozanên bavê-Têlî ka kê bir
Dibêjin ku Burca-Belek hilweşî
Text û bextê botiyan de ka geşî

Ka Azîzan, şêx û seyda û axa
Kanîn ew qesr, tev bilind û tev ava
Kanî Sitî, kanî jinmîr û cêrî
Kanîn ew rim, ka huwêzî, şeşperî
Kanî Xanî, Feqê Teyran û Mela
Yê Cizîrî, ne jî Batê, kes nema.

Celadet Bedirxan di helbesta xwe ya Bilûra Min de, bi gotinên herî xweşik û neqandî, hestên xwe bi vî rengî dinehwirîne:

“Bilûra min a şîrîn, tu di sariya sibehê û hingûra êvarê de
Hevalê bêhevalan, destbirayê şivan û dilketiyan î
Dengê te hêstirên dilên xemgîran
Silava ji hev veqetiyan
Girîn û zarîna dilketiyan tîne bîra min
Bilûra min.. tu yî, xemrevîna terkeserên dinyayê
.Dengê bilûra min

Celadet Bedirxan bi navê Were Dotmam jî, helbestekê diyarî hevjîna xwe Rewşen Xanimê dike û tê de dibêje:

“Dotmam. Wilo ye
Heta mirov xwe nas dike
Emrê xwe xelas dike
Ez pîr bûme di derxika canê min de çil buhar pişkivîne
Qurma bedena min çil zivistan dîtine
Bi sedan ba û bahozan ew hejandine
Were dotmam, were dotmam.

-----------

*** Têbênî :**

***Evdireheman Garisî** yek ji Rêbirên Şoreşa ŞêxSe`ydê pîran bûye dema ku dixwest ku vegere Bakurê Kurdistanê daku şerê Turkan bike pasvanê wî ew bi şêweyekî kîndar kuşt û serî wî da Cindermê Turkan.*



# GULAL KASANÎ

“Helbestvan pêjnkerê êş û azarên gelên xwe ye”

**Hevpeyvîn:** Imran Yûsiv



**“Gulal Kasanî, navê wî Gulal Hesen Husên e, ji malbateke herî kevnar e ku li herêma Tirbespiyê bi navê malbata Beglîxanê tê nasîn. Di sala 1968 an de li gundê Sogiya ji dayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî li gund bi dawî kiriye, ya emedekarî û navendî li bajarê Tirbespiyê tewaw kir. Li Zanîngeha Helebê xwendina mafperwerî xwendiye û belegeya Yasayî bidest xistiye.”**

-Çîroka we û nivîsê kengî û çawa destpê kir, der barê wan destpêkan de, hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

**-Di sala 1985`an de ji sedema bûyereke tenduristî derdora du mehan li ser doşekê dirêjkirî mam, wê hingê çend kovarên Kurdî mîna Stêr û Gelawêj û çend pirtûkên Kurdî li ber destên min hebûn; di wê demê de jixweber min xwe fêrî zimanê Kurdî kir .. Min dest bi nivîsîna çîrok û pendên Kurdî kir, dema ku dayika min di şevbûhêrkên zivistanî de li ber roniya lempê çîrok ji me re digotin, min jî nivîsandin. Di sala 1995an da, dema ku min Leşkeriya neçar di nav ertêşa Sûrî de dikir, min Yekem helbest bi navê Dilberê nivîsand.**

-Helbest ji bo we çi wateyê dide?

**-Helbest navgîneke mirovahîyê ye, xwedanê wê mirovekî hestedar e, wan diyardeyên xurist û xwezaya ku li dora wî ne bi çarçoveyek ciwankarî derdibirîne. Helbestvan pêjnkerê êş û azarên gelên xwe ye, her çax li xwe û derdora hawinga jiyanê bi palawanî nihîniyan ji tarîtiya kewdanan ber qefê zangan, li ber latên nîra stemê bi hostayî berz dike, û bi rengekî terezû û bi hostayî li ser pelê dirêse û bi xumava pênûsa xwe av dide.**

-Helbestvan ji kê re helbestên xwe dihûne ?

**-Helbest ji bo gel û kêşeya welat tête nivîsandin her wiha ji bo xwezayê, wêj e, bedewiya jiyanê, azar û êşên helbestvan jî têtin derbirîn.**

-Di navbera helesta tirazûkirî ya kilasîk û helbesta nûjen ya bexşane de, hûn bêtir rengê nûjen dinivîsin, bi dîtina we çi cudahî di navbera her du cureyan de heye, û çima hûn bêtir helbesta nûjen dinivîsin ?

**- Belê cudahiya di nav bera herdû cûreyan de ji aliyê bare, rêzbend, deryayan, û şêweyê danîna helebestê bixwe jî heye ..Jixwe helbestvan di baweriya min de du bijarde li nik wî pêkan in, yan Nûjen û yan jî Kilasîk , ji ber wiha bijartina cureyekê ji herdu bijardeyan li ser hest û pîvana wî ji helbestê re dimîne..**

**Helbesta nûjen ji gelek aliyan ve rehetiyê dide helbestvan ji wan şeyê xeyalê helbestvan bê zengo û hevsar e, dikare bi rehwan bibeze bêku biweste.**

**Dema helbesta nûjen dinivsînim geh dibim şêwekar; tabloyên rengreng bixêz dikim, geh dibim şeyê resen di deşt, zozan, best û delavên xwezaya welat de bi hesanî dibezim.**

-Di hûnandina helbesta xwe de, hûn bêtir guhdanê bi çi dikin, mijar û naverok an bi aliyê hunerî ji helbestê ?

**-Helbest Mijarên piralî ji hev wedjêre, û gelek babetên rengreng li gel hev parve dike û li gor karîna xwe dirêse ..Bê guman divêt ku ji aliyê hunerî ve were parzûnkirin daku li ser rûpelê bi bedewî birêje..**

-ji bilî helbestê, xebateke we di warê lêkolanên dîrokî de jî heye, der barê vê ezmûnê hûn çi dikarin ji me re bibêjin?

**- Belê Rast e, Berhema min ya Dîrokî ya ku bi navê ``Hebûn û koka Kurdan li Kurdistanê û bi Tayîbet li rojavayê Kurdistanê hatiye parvekirin..Ev Pirtûk li ser baweriyên nijadperestên Ereb ku li kurdan axivîne dide berdestan û nerînên rojhilatnasên ku li ser kurdan jî nivîsandina dide berçavan .. Ev pirtûk di sala 2014`an da hate amedekirin û di sala 2018`an da hate çap kirin ..Min**




**bixwe hin nerînên xwe jî di vê derbarê de parvekirine..**

-Xebateke we di warê ragihandinê jî heye, hûn rewşa ragihandina kurdî ya îronî çawa dinirxînin

**-Li rojavayê Kurdistan pir dezgehên ragihandinê hatine sazkirin ;ji aliyekî ve erênî ye û pirr xurt û bihêz in lê mixabin ne azad e tenê di çarçoveyekê de xebata xwe dike û ragihandin rehetiya xwe di parvekirina nûçeyan de nastîne. Dema ku tu bixwazî di dezgekş de xebata ragihandinê bikî mercek heye û divêt tu pê pabend bî, sensor li ser gelek mijaran heye ..Bigiştî di bin sîwana siyaseta partîtiyê de dixebitin.**

-Heya niha, çi berhemên we hene, û çi projeyên we ji bo siberojê hene ?

**-Berehmên çapkirî du pirtûk in, yek bi zmanê Erebî ye û ya din jî dîwaneke helbestî ye. Du dîwanên helbestî li ber destên min hene.**

-Gotina we ya dawî ?

**-Ez spasiya Kovara Welat dikim ku ev derfet da min daku xwe ji xwîneran re bidime naskirin.**

تتمة المقال **ما هو مرض التوحد؟**

و باعتبار تعقيد أسباب هذا المرض و عدم تشابه حالتين لهذا المرض و تطابقهما، فهذا يعني وجود عوامل عديدة و أسباب مختلفة لهذا المرض.

**أسباب وراثية**

اكتشف الباحثون وجود عدة جينات يرجح أن لها دورا في التسبب بالذاتوية، بعضها يجعل الطفل أكثر عرضة للإصابة بالاضطراب، بينما يؤثر بعضها الآخر على نمو الدماغ وتطوره وعلى طريقة اتصال خلايا الدماغ فيما بينها. قد يكون أي خلل وراثي، في حد ذاته وبمفرده، مسؤولا عن عدد من حالات الذاتوية، لكن يبدو، في نظرة شمولية، إن للجينات، بصفة عامة، تأثيرا مركزيا جدا، بل حاسما، على اضطراب الذاتوية. وقد تنتقل بعض الاعتلالات الوراثية وراثيا (موروثة) بينما قد تظهر أخرى غيرها بشكل تلقائي

**عوامل بيئية:**

مثل الكثير من المشاكل الصحية التي تكون نتيجة لعوامل وراثية وعوامل بيئية، مجتمعة معا، فإن هذا ينطبق على مرض التوحد أيضا.

ويفحص الباحثون، في الآونة الأخيرة، احتمال أن تكون العدوى فيروسية، أوالتلويث البيئي (تلوث الهواء، تحديدا)، على سبيل المثال، عاملا محفزا لنشوء وظهور مرض التوحد.

**عوامل أخرى:**

ثمة عوامل أخرى، أيضا، تخضع للبحث والدراسة في الآونة الأخيرة، تشمل: مشاكل أثناء مخاض الولادة، أو خلال الولادة نفسها، ودور الجهاز المناعي.

ويعتقد بعض الباحثين بأن ضررا (إصابة) في اللوزة (–وهي جزء من الدماغ يعمل ككاشف لحالات الخطر – هو أحد العوامل لتحفيز ظهور مرض التوحد.

تتمحور إحدى نقاط الخلاف المركزية في كل ما يتعلق بالتوحد في السؤال عما إذا كانت هنالك أية علاقة بين التوحد وبين جزء من اللقاحات المعطاة للأطفال. فقد كان الشك يدور حول وجود مادة الثيميروسال التي تحوي كمية ضئيلة من الزئبق كمسبب للتوحد .

بالرغم من أن غالبية اللقاحات المعطاة للأطفال اليوم، لا تحتوي على الثيميروسال، وذلك ابتداء من العام 2001، إلا أن الخلاف والجدل ما زالا قائمين.

و لكن أثبتت دراسات وأبحاث شاملة أجريت مؤخرا أنه ليست هنالك أية علاقة بين اللقاحات وبين التوحد.

**عوامل خطر الإصابة بالتوحد**

لا يرتبط مرض التوحد بأي عرق أو جنس بشري دون غيره و لكن هناك عوامل تزيد من فرص الإصابة بهذا المرض منها:

**جنس الطفل:** أظهرت الأبحاث أن احتمال إصابة الأطفال الذكور بالذاتوية/ التوحد هو أكبر بثلاثة . أربعة أضعاف من احتمال إصابة الإناث

**التاريخ العائلي:** العائلات التي لديها طفل من مرضى التوحد، لديها احتمال أكبر لولادة طفل أخر مصاب بالمرض.

ومن الأمور المعروفة والشائعة هو أن الوالدين أو الأقارب الذين لديهم طفل من مرضى التوحد يعانون، هم أنفسهم، من اضطرابات معينة في بعض المهارات النمائية أو التطورية، أو حتى من سلوكيات ذاتوية معينة.

**اضطرابات أخرى:** الأطفال الذين يعانون من مشاكل طبية معينة هم أكثر عرضة للإصابة بالذاتوية. هذه المشاكل الطبية تشمل:

**الأمراض الجينية**

**سن الوالد:** يميل الباحثون إلى الاعتقاد بأن الأبوة في سن متأخرة قد تزيد من احتمال الاصابة بالتوحد.

فقد أظهر بحث شامل جدا أن الأطفال المولودين لرجال فوق سن الأربعين عاما هم أكثر عرضة للإصابة بالذاتوية بـ 6 أضعاف من الأطفال المولودين لآباء تحت سن الثلاثين عاما. ويظهر من البحث أن لسن الأم تأثيرا هامشيا على احتمال الإصابة بالذاتوية.

**تشخيص مرض التوحد**

بعيدا عن الأطباء و المعالجة في المراكز المتخصصة، فإن توعية الوالدين في مراقبة سلوك أطفالهم و الملاحظة الدقيقة الاستجابات الطفل السلوكية و اللغوية تعتبر عاملا حاسما في اكتشاف أي خلل مبكر لا سمح الله و بالتالي مراجعة الطبيب المختص الذي سيقوم بإجراء الفحوصات المنتظمة للنمو والتطور بهدف الكشف عن أي تأخر في النمو لدى الطفل.

و باعتبار أن كثير من حالات التوحد صعبة على الكشف و تختلف درجة خطورتها حتى من قبل الطبيب، فإن مراقبة الأهل لسلوك طفلهم و مهاراته اللغوية و ردات فعله السلوكية و الاجتماعية تلعب دورا كبيرا و مساعدا للطبيب في تحديد أعراض و درجة خطورة المرض. حيث يقوم الطبيب بمحادثة مع الأهل عن مهارات الطفل الاجتماعية، قدراته اللغوية، سلوكه وعن كيفية ومدى تغيّر هذه العوامل وتطورها مع الوقت. وقد يطلب الطبيب، بغية تشخيص اعراض التوحد، إخضاع الطفل لعدة فحوصات واختبارات ترمي إلى تقييم قدراته الكلامية واللغوية وفحص بعض الجوانب النفسية.

وبالرغم من أن أعراض التوحد الأولية تظهر، غالبا، في ما قبل سن الـ 18 شهرا، إلا أن التشخيص النهائي يكون، في بعض الأحيان، لدى بلوغ الطفل سن السنتين أو الثلاث سنوات، فقط، عندما يظهر خلل في التطور، أو تأخير في اكتساب المهارات اللغوية، أو خلل في العلاقات الاجتماعية المتبادلة، والتي تكون واضحة في هذه المرحلة من العمر.

وللتشخيص المبكر أهمية بالغة جدا، لأن التدخل المبكر، قدر الإمكان، وخصوصا قبل بلوغ الطفل سن الثلاث سنوات، يشكل عنصرا هاما جدا في تحقيق أفضل الاحتمالات والفرص لتحسن الحالة.

بسبب اختلاف مسببات مرض التوحد فطرق علاجه متعددة و متشعبة أيضا لذلك لا يمكن الاعتماد على طريقة بعينها للعلاج. و يعتمد اعتماد نوع من العلاج على الطبيب المختص.

يمكن للطبيب المعالج المساعدة في إيجاد الموارد المتوفرة في منطقة السكن والتي يمكنها أن تشكل أدوات مساعدة في العمل مع الطفل مريض التوحد.

**علاج التوحد يشمل:** العلاج السلوكي وعلاجات أمراض النطق واللغة – العلاج التربوي – التعليميّ –العلاج الدوائي.

**بعض العلاجات البدلية:** ابعاد الأطفال عن تناول الأغذية المعلبة و التي تحوي مواد حافظة مثل: المرتديلا –المعلبات

–بطاطا شيبس –السكاكر بجميع انواعها –الابتعاد عن الدهون المشبعة كالسمن و التركيز على الخضار و الفواكه و السمك و لحوم الدجاج و شرب المياه الصحية



# ما هو مرض التوحد؟

هيلا محمد

مرض التوحد (أو الذاتوية-التقوقع على الذات) هو اضطراب يرتبط بنمو الدماغ و النمو العصبي لدى الأطفال الذي يؤثر بدوره على تمييز الطفل للأشخاص و كيفية التعامل و التفاعل الاجتماعي معهم. و باعتبار أن الإنسان كائن اجتماعي ينمو في ظل علاقات اجتماعية مستقرة فإن المصاب بالتوحد يواجه مشكلات كبيرة في التفاعل و التواصل الاجتماعي.

**متى يظهر التوحد؟**

يظهر مرض التوحد أو الذاتوية في سن الرضاعة و مع هذا قد ينمو الطفل بشكل طبيعي دون مشاكل في الأشهر التالية بل و حتى سن الثانية أو الثالثة و فجأة يبدأ الطفل بالانطواء و التقوقع على ذاته و يصبح عدائيا و يفقد مهاراته اللغوية التي تعلمها إلى تلك السن.

**أعراض التوحد**

على الرغم من أن كل طفل مصاب بهذا المرض يظهر أعراضا تختلف من طفل إلى آخر، فإن هناك أعراض عامة و مشتركة بين أغلب المرضى منها:

**1- المهارات الاجتماعية**

يتسم سلوك الطفل الاجتماعي بالبلادة و ضعف أو انعدام ردود الفعل تجاه أي مؤثر خارجي مثل الضحك أو الابتسامة في وجه الأب و الأم المبتسم أو الضاحك.

لا يستجيب لمناداة اسمه. - لا يُكثر من الاتصال البصريّ المباشر.- غالبا ما يبدو أنه لا يسمع محدّثه. - يرفض العناق أو ينكمش على نفسه. - يبدو إنه لا يدرك مشاعر وأحاسيس الآخرين. - يبدو أنه يحب أن يلعب لوحده، يتقوقع في عالمه الشخص الخاص به.

**2- المهارات اللغوية**

يبدأ الكلام (نطق الكلمات) في سن متأخرة، مقارنة بالأطفال الآخرين. - يفقد القدرة على قول كلمات أو جمل معينة كان يعرفها في السابق. - يقيم اتصالا بصريا حينما يريد شيئا ما. - يتحدث بصوت غريب أو بنبرات وإيقاعات مختلفة، يتكلم باستعمال صوت غنائي، وتيريّ أو بصوت يشبه صوت الإنسان الآلي (الروبوت).- لا يستطيع المبادرة إلى محادثة أو الاستمرار في محادثة قائمة. - قد يكرر كلمات، عبارات أو مصطلحات، لكنه لا يعرف كيفية استعمالها.

**3- السلوك**

ينفذ حركات متكررة مثل، الهزاز، الدوران في دوائر أو التلويح باليدين. - ينمّي عادات وطقوسا يكررها دائما. - يفقد سكينته لدى حصول أي تغير، حتى التغيير الأبسط أو الأصغر، في هذه العادات أو في الطقوس. - دائم الحركة يصاب بالذهول والانبهار من أجزاء معينة من الأغراض، مثل دوران عجل في سيارة لعبة. - شديد الحساسية، بشكل مبالغ فيه، للضوء، للصوت أو للمس، لكنه غير قادر على الإحساس بالألم.- يعاني الأطفال صغيرو السن من صعوبات عندما يُطلب منهم مشاركة تجاربهم مع الآخرين. وعند قراءة قصة لهم، على سبيل المثال، لا يستطيعون التأشير بإصبعهم على الصور في الكتاب. -يجب الانتباه إلى مهارة التأشير بالإصبع إلى صور الكتاب كمؤشر قوي على هذا المرض لأن هذه المهارة الاجتماعية، التي تتطور في سن مبكرة جدا ضرورية لتطوير مهارات لغوية واجتماعية في مرحلة لاحقة من النمو.

لحسن الحظ كلما تقدم الأطفال في السن نحو مرحلة البلوغ، يمكن أن يصبح جزء من هؤلاء الأطفال المصابين بالتوحد أكثر قدرة واستعدادا على الاختلاط والاندماج في البيئة الاجتماعية المحيطة، ومن الممكن أن يُظهروا اضطرابات سلوكية أقل من تلك التي تميز مرض التوحد، حتى أن بعضهم ينجح في عيش حياة عادية أو نمط حياة قريبا من العادي والطبيعي.

و لكن في المقابل، تستمر لدى مرضى آخرين صعوبات في المهارات اللغوية وفي العلاقات الاجتماعية المتبادلة، حتى أن بلوغهم يزيد في مشاكلهم السلوكية و الاجتماعية..

قد يكون قسم من هؤلاء الأطفال المصابين بالتوحد بطيئون في تعلم المعلومات والمهارات الجديدة. و قد يتمتع بعضهم الآخر بنسبة ذكاء طبيعية، أو حتى أعلى من الأشخاص العاديين السليمين. فهم قد يتعلمون بسرعة، لكنهم يعانون من مشاكل في الاتصال، و في التأقلم الاجتماعي مع غيرهم. قسم ضئيل جدا من الأطفال الذين يعانون من مرض التوحد يكونون مثقفون ذاتويّون وتتوفر لديهم مهارات استثنائية فريدة، تتركز بشكل خاص في مجال معين مثل الفن، الرياضيات أو الموسيقى.

**أسباب وعوامل خطر مرض التوحد**

ليس هنالك عامل واحد و وحيد كمسبب مؤكد، و قاطع، لمرض التوحد.

تتمة المقال على الصفحة ١٠




# حملة "قاطعوا البضائع التركية لإنقاذ أرواح أطفالنا"

## تقرير مجلة ولات

بسبب الحرب الدائرة في سوريا بين النظام وما تسمى المعارضة السورية والتي بدورها أدت الى انهيار البنية التحتية في البلد وخروج أغلب المعامل السورية من الخدمة ولا سيما في حلب التي كان قلب الصناعة السورية بالإضافة إلى سرقة أغلب المعامل من حلب من قبل الدولة التركية

مما أدى إلى افتقار سورية من أنتاج احتياجات الشعب ولا سيما الغذائية

وبالرغم من استراد سوريا تلك المواد من الدول المجاورة إلا أن المناطق في شمال وشرق سوريا لم تكن لها حصة من تلك الاحتياجات بس اغلاق الطرقات و تكاليف الشحن الباهظة

لذلك كان معبر سيمالكا بين روجافا و أقليم كوردستان المنفذ للوصول الى تلك الاحتياجات و باعتبار أقليم كوردستان أيضا تفتقر من ناحية الصناعة فهي أيضا تستورد أغلب بضائعها من تركيا وايران ومنها تصل تلك البضائع إلى روجافا عن طريق التجار

بعد الغزو التركي لمناطق روجافا في سري كانييه وكري سبي أطلق العديد من التجار والناشطين حملة دعوا فيها إلى مقاطعة البضائع التركية لأن أرباح هذه البضائح تتحول الى رصاص و قذائف تقتل شعبنا .

وهذه الحملة الشعبية تلقى رواجاً متصاعداً بين التجار وعامة الشعب وليس فقط في روجافا كان لتجار الأقليم كوردستان العراق أيضا في تلبية دعوات النشطاء بمقاطعة البضائع التركية.

أحمد علي مواطن من عامودا تحدث لمجلة ولات حول مقاطعة البضائع التركية قائلا:

«لقد تجاوبا مع حملة مقاطعة البضائع التركية و التي دعا إليها قطاع واسع من عامة الناس و ذلك من منطلق شعورنا الوطني والإنساني و الأخلاقي تجاه العدوان الظالم الذي يشنه جيش الاحتلال التركي على مناطقنا و يتسبب في قتل شعبنا و تشريده. لذلك قررنا مقاطعة شراء البضائع والسلع التركية, إيمانا منا بأن ما نشتريه من بضائع تركية تذهب تلك الاموال التي إلى آلة القتل التركية لقتل المزيد من الأبرياء من شعبنا لذلك أدعو كافة الناس الى عدم شراء السلع التركية لحفظ دماء أطفالنا. لكن رغم أن الحملة التي دعا إليها الناشطون لعبت دورا مهما إلا أن هناك فراغ في الأسواق في ظل غياب الخيارات الأخرى.وعلى الرغم من أن حملة مقاطعة البضائع التركية تشكل ضغطا على الاقتصاد التركي إلا أنها تزيد من مأساة الكرد في الشمال السوري بسبب عدم وجود البديل."

كما تحدث السيد فرهاد حسن و هو مواطن من عامودا لمجلة ولات و قال:

«نحن نؤيد مطالب عامة الشعب بمقاطعة البضائع التركية لكي لا تذهب أموالنا لدعم آلة القتل التركية والتأثير على التجار الاتراك والاقتصاد التركي لكن بنفس الوقت يجب التنبيه بأن هذه المقاطعة قد تؤثر على شعبنا هنا أيضا وذلك لعدم وجود البديل ونحن بحاجة الى مصادر بديلة لان أسواقنا تفتقد انواع من البضائع وحتى لو وجد بعض البدائل فأسعارها مرتفعة نوعا ما لذلك نطالب الادارة الذاتية بالعمل على توفير التسهيلات للتجار لاستراد البضائع من جهات أخرى وكذلك نطالب اقليم كردستان العراق بأستراد البضائع من دول أخرى فهم لهم علاقات و إمكانات أستراد بضائعهم من دول أخرى."

و تأتي هذه الحملة بعد أن شن جيش الاحتلال التركي هجوما على مناطق سري كانييه و كري سبي و قصف المدن الكردية على طول الحدود مما نجم عنه نزوح مئات الالاف من المدنيين بالإضافة الى ارتكاب القوات المهاجمة من الجيش التركي و الفصائل السورية المسماة (الجيش الوطني) الكثير من المجازر و جرائم الحرب بحق سكان المنطقة. مما ولد حالة غضب و استنكار و شجب بين أبناء المنطقة الذين كانوا يعيشون بأمن و سلام قبل الغزو التركي لمناطقهم. و قد خلف العدوان التركي كارثة انسانية كبيرة .





# PÎREMÊRD (1868-1950)

Navê wî Tofîq e, kurê Mihemed axayê kurê Hemze axayê Mesref e. li bajarê Silêmaniyê yê başûrî Kurdistanê di sala 1868an de ji dayik bûye. Di şeş-heft saliya xwe de li hucreya mele Huseynê Xoce û li ber destê wî hînî xwendinê dibe. Helbestên helbestvan Hafizê Şîrazî dixwîne. Piştî ku xwendina xwe li wir bi serkeftin bidawî dike û dibe feqe, diçe cem mela Mihemed û li ber destê wî hînî zimanê farisî, erebî û hin dersên ayînî dibe.

Di navbera salên 1882 û 1895an da, dibe karmendekî hukûmetê. Destpêkê li şarê Silêmaniyê dibe (katibê nifûsê), piştre dibe (başkatib), paşê li kerbelayê dibe katibê dadgehê. Di sala 1898an de li gel şêx Seîdê Hefîd bavê şêx Mehmûdê Hefîd diçe Turkiyê, û li gel wî diçe hecê. Piştî ku ji hecê vedigere li gel Şêx Ehmedê Xaneqa û Wefayî yê helbestvan dîsan diçe Turkiyê. Li Stembolê pê dihesin ku ew zimanê farisî baş dizane, lewre wî dikin endamê (Alî-Meclis) û ritba begetiyê didinê.

Li Stembolê Tofîqî hacî diçe (Mekteba huqûqê) û mafnasiyê dixwîne, û bawernameya parêzeriyê werdigire, pişt re bi qîzeke tirk re dizewice. Û dest bi karê parêzeriyê û nivîsê dike. Di heman demê de hewl dide ku rojname û kovaran derxîne.

Wê demê, sala 1907an, li Stembolê komeleke kurdî bi serokatiya şêx Ebdilqadir şêx Ebdille tê damezirandin. Tofîq hacî tev li wê komelê dibe, û dest bi karê ronakbîrkirina kurdan dike.

Sala 1909an dibe qayimeqamê Çolemergê, û sala 1918an dibe (Muteserefê Amasayê), di pişt re hevjîna xwe û du kurên xwe li Turkiyê dihêle û vedigere bajarê xwe Suleymaniyê. Wê hingê rojnameya (Jîn) bi serkarîya Huseyn Nizam li Suleymaniyê çap dibû. Huseyn Nazim serperiştiya wê rojnameyê dispêre Tofîq Hacî.

Ked û xebata Pîremêrd di biwarê wêje û nivîsê da pir berz û bilind bilind e, ew ne tenê berevker û çapkerê pend û kultura kurdî bûye, lêbelê helbestvan û nivîskarekî bejinbilind bûye, di heman demê de ronakbîr û rewşenbîrekî xwedî hizir û ramnên netewî û mirovî bûye, û di gelek biwaran de dinivîsî.

Helbestvanê nemir Pîremêrd di sala 1950 da koça dawî kir, û gelek berhemên ciwan û hêja li pey xwe hişt.

Ev jî yek ji hebestên wî ye, ku pir bi nav û deng e:



**Newroz**

Eva roja sala tezeye, Newroz hatiye,
Cejna kevne kurde bi xweşî hatîye,
Her xûna lavan bû gola ava nû bihar,
Vî rengî sore bû ke asoyê bilindî kurd,
Mizgîna beyanê bo gele dûr û nêzîk bir,
Newroz bû agirekî weha xiste nav ceger,
Lawan bi eşq diçûn pêşber mirin,
Awa rojhilat ji bedena berza welat
Xûna şehîdê, rengê şefeq şewq vedaye
Heta nika li tarîxa milet da rû nede,
Qelxana gulê singe keçikan be li hilmet da
Bo şehîdê weten naxwaze şîven û girîn
Ew namirin, wa li dilê milet da dijîn. ■

# DERENGIYA BARÎNA BARANÊ METIRSIYÊ DIXE DILÊ XELKÊN ROJAVA



Efsan Kurdî

Li Sûriyê, xaka cezîrê û rojavayê kurdistanê ji bo çandinia genim, ceh û nîskan pir guncaw e û ji vê hêlê de em dikarin bibêjin ku zembîla genimê sûriyê ye. herweha debara jiyana xelkên vê deverê bi rengekî sereke girêdayî çandiniyê ye, çandinî jî girêdayî rêjeya barîna baranê ye.

Îsa payîzxêrk neket, û werzê payîzê bi zuhayî derbas bû, û ev yek rewşa çandiniyê dixe nava metirsînê de. Cotkar dibêjin ku eger baranî baranê derengtir bû dê rewşa çandiniyê pir xirab e. û dê ziyaneke mezin li rewşa wan ya abûrî bibe, çimkî par piraniya zeviyan rastî şewatê hatin û berhemên wan yên çandiniyê tevde têkçû û xisaretek pir ezin li wan bû. Di der barê vê mijarê da, welatiyê ji Amûdê Semîr Mûsa ku ew jî xwediyê zeviyekî ye, ji kovara Welat re axivî û got:

"Îsal barîna baranê gelek dereng ket û payîzxêrk ziha derbas bû, her kes dizanin ku di meha 12 an de gelek caran berf dibariya lê îsal heya niha hîn baran nebariyaye, ev yek metirsiyê dixe dilê me de. nemaze ku sala bûrî jî piraniya çandiniyê têkçû him ji ber lehiyan û him ji ber şewata zeviyan.

Eger îsal jî çandinî li rojava têk biçe bi taybet di vê rewşa abûrî ya zehmet de wê karîsetek li rojava biqewime ji ber ku debara jiyana piraniya xelkê vê deverê wan li ser çandiniyê ye.

Û eger Xwedê neke çandinî têk biçe dê bandorê netenê li cotkaran û xwediyê zeviyan bike lê dê bandor li hemû qatên civakê bibe, û dê rewşa abûrî têkbiçe, û dibe ku ev yek bibe sedema birçîbûneke xirab, anku xila dê rabe. "

Dernegiya barîna barînê metirsiyeke mezin li bal xwedîkerên pez û sewalan jî afirandiye.

Dêrsim Alî ku ew yek ji xwedîkerên pez û sewalan e metirsîna xwe anî ziman û got: "Derengiya barîna baranê netenê ji bo cotkaran û xwediyên zeviyan, lêbelê ji bo me û tevahiya gelê deverê cihê metersînê ye. rêjeyeke mezin ji gelê deverê pez û sewalan xwedî dikin, û jiyana wan a abûrî girêdayî vî karî ye, û eger baran nebare û şînkahî dernakeve û em ê neçar bimînin ku êm ji bo sewalên xwe bikirin û ev yek li ser me giran e, çimkî nirxê êm pir buha ye, her weha dê nirxê sewalan jî dakeve û ev jî jib o me karîteke mezin e.

Em destên xwe li ber xweda vedikin û lava jê dikin ku li rewşa me binêre û baranê ji me re bişîne."

Hêjayî gotinê ye ku netenê derngbarîna baranê, lê êrîşa Turkiyê ya li ser Serê Kaniyê û Girê Sipî bandoreke xirab li rewşa çandiniyê li deverê kir, gelek zeviyên wan devera dê neçandî bîmînin çimkî artêşa Turkiyê û çeteyên bi ser rênadin cotkarên kurd ku vegerin û çandiniya xwe bikin, her weha gelek ji wan zeviyan dê rastî dizî û talankirinê werin mîna ku li Efrînê hate kirin.



## FERHENGOK

| | |
|---|---|
| afirandin | خلق |
| derûnnas | عالم نفس |
| civaknas | عالم اجتماع |
| bizîşk | طبيب |
| abornas | عالم اقتصاد |
| dîroknas | مؤرخ |
| lêkoler | باحث |
| lêkolan | بحث |
| vedîtin | اكتشاف |
| erdnîgarî | جغرافيا |
| zanîn | علم- معرفة |
| behre | موهبة |
| şînwar | آثار |
| behremend | موهوب |
| şiyan | امكانية-استطاعة |
| karîn | قدرة |
| zanyar | عالم |
| zanîngeh | جامعة |
| zanyarî | معلومة |
| şîwarnas | عالم آثار |



# XELKÊN SERÊ KANÎYÊ, RABORÎYEKA TIJÎ ŞER Û AYINDEYEKA NEPENÎ

**Amadekar: Lava Îsa**

Di çarçoveya pilana paqijkirina nijadî û guhertina demografîk ya ku Tirkîye weke stratejîyekê li dij gelê kurd pêk diîne û piştî ku Efrîn dagir kirin, vê carê berê çeteyên rikeberîya sûrîyeyî dane warê bingeh û koka kurdan, Serê Kanîyê. Piştî êrîşa bibinkeftî ya ku di 2013an da pêk anîn û ji ber ku firoke ne li pişta wan bû, mîna kerîyê pez ji Serê Kanîyê bi destê hêzên kurdî hatin qewitandin, dîsa careka din û bi palpiştîya firokeyên dewleta dagirkir di 9ê cotmeha 2019an berê tivenga xwe dane Waşûkanîyê. Êrîşa hovane her tişt armanc digitin, cihê kombûna sivîlan berî xal û beregehên leşkerî, navendên elekitrîkê, navendên avê, nexweşxane hwd; da ku bajar ji xwedîyên xwe vala bibe û çete û pêxwasên xwe lê bi cih bikin. Bi sedema vê êrîşê, bi hezaran malbat ji warê xwe penaber bûn û ji bajarê xwe derketin. Di navbera 300-400 hezar kesî da ji Serê Kanîyê û Girê Spî bi darê zorê û ji ber armancgiritna bizanebûn ji silvîlan ra, niha li bajarên din yên rojavayê Kurdistanê penaber in.

Xelkên Serê Kanîyê li bajar û gundên Rojavayê belav bûn û piranîya wan li dibistanan bi cih bûn. Li jêrê, gotin û govanên sê kesan ku tev li malbata xwe neçar mane ji bajêr derkevin, dihên rêzkirin:

1. Leyla Mihemed Qewas, jidayîkbûn 1976; Serê Kanîyê, kolana Evdilrehman el-Xafiqî.

Piştî êrîşa Tirkîyeyê û çeteyên bi ser wê ve yên ku navê Artêşa Niştimanî li xwe dikin li dij Serê Kaniyê, Leyla li gel malbata xwe hevjînê wê û çar kur, neçar ma ji bajêr derkeve. Leylaya ku berî vî şerî, jiyana xwe bi xweşî derbas dikir, îro bi destê wan çeteyan, talbûna penaberîyê jiyan dike. Mamoste Leyla li Dibistana el-Xafiqî, karê mamostetîyê dikir. Wê digot ku berî şer rewş aram bû, rast e hindik tirs ji ber gefan hebû, lê wan bawer nedikir ku dê şer rû bide. Çimkî bawer nedikirin ku dewlet û Neteyweyên Yekbûyî rê bidin vê êrîşê. Roja yekem ji êrîşê; Leyla dibêje: “Hevjînê min ne li vir bû, tenê ez û zarokên xwe li malê bûn. Me bihîst ku firokeya cengê taxa Mişrafa bombebaran kiriye, lê me nedixwest em zû bi zû ji Serê Kanîyê derkevin. Piştra pênc firoke bi hev ra li esmanê bajar difirîyan û dest bi topbaranê kirin. Wê demê milet tirsîya û ji malan derket, tevger û tevlihevîyeka mezin li bajêr çêbû. Zarokên min ditirsiyan û digiriyan. Rewşeka pir nexweş bû û nayê wesfkirin. Bajarê min di bin topbaranê da bû, li her alî dûman e, ji erd û esman êrîşî me dikirin. Bajar tev da bûbû agir. Ez li benda hevjînê xwe bûm ta were me bibe; min zarokên xwe bi mala bavê xwe ra şandin. Gel bê ku rahêle tu tiştî, ji malên xwe derketin, her tişt li pey xwe hiştin. Bi awayekê seyr topbaran dikirin. Hetanî roj çû ava ez li bajêr mam li benda hevjînê xwe, lê nikarîbû bigihîje wir, lewra ez bi mala cîranên xwe ra derketim. Çar rojan, em çar malbat di hindirê siwareyê (foks) da man, me tu kes nas nedikir li derveyî Serê Kanîyê ku em biçin li cem. Piştra me berê xwe da Hesekê. Li wir xaniyekê biçûk bi dest me ket û em her çar malbat li wî xanî bi cih bûn. Xanî bê navmal bû, tiştek lê nebû. Av li ser Hesekê qut kiribûn. Lewra me berê xwe ji wir da Qamişloyê. Rewşa me pir xirab e. Em çar malbat di malekê da





ne. Rêxistinên mirovî yên navdewletî xwe ji Rojavayê kişandin û rêxistinên xwecihî jî nikarin ji pêdivîyên me ra bibin bersiv. Derûnîya zarokan pir xirab bûye, ji her dengê bilind ditirsin.”. Hêvîya Leylayê ew e ku li bajarê xwe li mala xwe, mala ku niha ji hêla çeteyan ve hatîye desteserkirin, vegere.

2. Bêrîvan Evdilqadir Hesen 1993, ji Serê Kanîyê, taxa Mehete.

Bêrîvan bi her sê zarokên xwe ra kurek û du keç û hevjînê wê, li gel dêya hevjînê xwe û xwîşka wî li Serê Kanîyê dijîya. Wê bawer nedikir ku dê çete êrîşî bajar bikin. Bêrîvanê digot: “Jiyana me berî şer pir xweş bû. Her tişt li cem me peyda dibû. Miletê Serê Kaniyê ji hev hez dikir û bi ser hev da diçû û dihat. Lewra niha em rastî şkestinekê hatine. Şeva êrîşê me bihîst ku dê berbangê dest bi şer bikin. Em raneketin. Me digot ka dê çi bibe? Dê çarenûsa me çi be, em ê zarokên xwe bi ku ve bibin? Dilê me ne tenê bi ser bajarê me ve bû, lê li ser Rojava bi giştî diêşîya, çimkî rast e şerê herî giran li cem me bû, lê li her bajarî şer û topbaran hebû. Me firavîn dixwar û firokeyê dest bi bombebaranê kir. Me digot ew ê tenê xalên leşkerî armanc bigirin, ew qet li sivîlan naxin. Topbaran giran bû, lewra em neçar man derkevin. Rêya ku gel tê ra derdiket derveyî bajêr, rastî bombebaranê dihat. Em derketin û sekinîn me li bajar dinêrî, destê me jê nedibû; me nema zanîbû em çi bikin. Em deh rojan li gundekê nêzîkî Serê Kanîyê man, bi hêviya ku şer raweste û em li bajarê xwe vegerin. Lê her şer girantir dibû, lewra em neçar man berê xwe bidin Qamişloyê”. Ev êrîşa hovane ji Bêrîvanê ra şokeka derûnî mezin çêkir, heta niha ew bawer nake ku ew penaber e. Xizmên wê hin li Qamişlo, hin li Hesekê û hin jî li başûrê Kurdistanê ne. Niha ew li gel çar malbatan di malekê da li Qamişloyê bi cih dibin. Bêrîvanê dibêje: “Ez tiştekî tenê dixwazim, hêviya min li vê diniyayê niha ... ez amade bibînin ku xaniyê min bi firokeyan hatiye bombebarankirin, jixwe niha şewitandine, wêneyên wî ji me ra hatin. Heger firokeyê jî ew topbaran kiribe, ez amade me konekî li ser kevir û kavilê wî vedim û serê xwe li ser kevirekî ji wan keviran deynim; hema ez bizanim ev bajar bajarê min e û ev mal mala min e”.

3. D. B 1986, ji Serê Kanîyê.

Sê kurên wê hene û tev li hevjînê wê malbat dibe pênc kes. Li gor wê, rewş li Serê Kanîyê berî êrîşê pir xweş bû, aramiyek çê bûbû û jiyan xweş diçû. Piştî şer rewşa wan gelekî xirab bû û bi darê zorê ji bajar derketin. Du şevan ew di siwareyê da man, ne razan, ne xwarin û ne vexwarin nebû. Piştra hatine Qamişloyê. Ew pir ditirsîyan. Wan nizanîbû ku heger derkevin, êdî hew vedigerin. Ew û hevjînê xwe debara jiyana xwe dikin û pêdiviyên zarokan peyda dikin. Rêxistinên mirovî ji ber ku şiyanên wan bisînor in û hejmara penaberan pir mezin e, nikarin pêdivîyan pêk bînin. Hêvîya xwe wiha anî li ser zimên: “Ez dixwazim vegerim mala xwe, heger dîwar tenê jî mabe xem nake, yanî navmalên me û hemû tiştên çûbin bereqa, bes em dixwazin vegerin malên xwe, vegerin ber dîwarên xwe. Bila xirab bûbe, em ê gişî çêkin, bes em dixwazin vegerin mala xwe; li ber dîwarê xwe.”



# QUBÎLAY XAN AN BÎNAHIYEK JI XEWNEKÊ. LETEK



**Samuel Taylor Coleridge***

**Werger ji Inglîzî: Şêrko Dakorî**

Li Zanadûyê Qubîlay Xan
Ferman da ku koşkeke xweşiyê ava bibe:
Alf, çemê pîroz, diherikî li wê dera han,
Di şkeftinan re ku ti carî nayên pîvan,
Ber bi deryayekê ku rojê nabîne.

Wiha du caran pênc mîlên ji erda biber
Dîwar û birc li dorê avakirî wek kemer;
Û gulistanine ron digel rûbarine kenarpêl hebûn,
Ku li wan gellek darên bixûrê dibişkivîn;
Û daristanên li wir wek giran kevnar bûn,
Li dor xaline bertav û keskîn ...

Lê ax! Ew newala kûr a romansî ya ku berjêr diçû
Ji girê kesk û di nixêvekê re ji kaj!
Cihekî hov! Wiha pîroz û serdilkirî
Bi qasî ku li bin heyva lawaz
Jinekê ji bo yarê xwe yê dêw qêrîn kirî!
Û ji vê newalê, bi tengijîneke keliyayî bê rawestan,
Wek ku bi helkelkeke bilez û stûr bihna erdê bê vedan,
Avweşînkeke hêzdar bi kotekî hate derxistin:
Ku di orta teqîna wê ya bilez û nîv-birrî de
Letine girs çeng dikirin wek zîpika ku hiltepe,
An wek libên belavbûyî di bin genimqutê cotkar de:
Û di nav van latên semaker de carekê û heta heta
Çemê pîroz her kêlîkê hildipekiya.
Pênc mîlan bi tevgereke alozgehî
Çemê pîroz herikî li nav daristan û geliyan,
Pişt re giha şkeftên ku ti carî nayên pîvan,
Û bi şilejan kete osiyaneke mirî:
Û di vê şilejanê de dengine bo Qubîlay Xan ji dûr hatin,
Dengên bapîran bûn ku şer vedigotin!

Siya ku koşka xweşiyê dida
Li nîvê rê bi ser pêlan keft
Li wir dengekî têkil veda;
Jêdera wê avweşînk bû û şkeft.
Ew derhozeyeke ji dahênaneke bêzin bû
Koşkeke bertav lê şkeft sehol bû!

Xanimek digel sentûrekê
Min di bînahiyekê de dît carekê:
Ew navmaliyeke hebeşî bû
Ku li sentûrê dijeniya
Û li ser çiyayê Abora distira.
Ger min bikarîba di hindirê xwe de vejanda
Hevawaz û strana wê
Wê kêfeke evqasî kûr bo min bida
Ku bi mûzîka bilind û dirêj
Min ew koşk li ezmanan ava bikira,
Ew koşka bertav! Ew şikeftên ji seholê!
Û yên ev mûzîk bibihîztana wê ew li ber çavên xwe bidîtana,
Û gişan wê bikirana qêrîn, Ha ji xwe hebe!
Ha ji xwe hebe!
Çavên wî çawa diçirisin! Porê wî çawa difire!
Cergeyekê li dora wî bikêşin sê caran,
Û çavên xwe bigirin bi saweke pîroz,
Ji ber ew li ser gezûyê mezin bûye
Û ji şîrê bihiştê vexwariye.

---

** **Samuel Coleridge** (1772 - 1834) helbestvan, rexnegir, û fîlosofekî inglîz bû û yek ji damezrênerên tevgera romansî li Ingeltrayê bû. Helbesta wî "Qubîlay Xan" yek ji helbestên herî navdar e di toreya inglîzî de ku tê de Coleridge xewneke xwe dibêje. Di vê xewnê de wî imperatorê mexolî Qubîlay Xan û koşka wî dîtin.*

# شذرات

بهرام حسو



1

نحن أبناء البيادر
مخبأ في جنباتنا عطر البراري
ورائحة الخبز المنقوش على وجهه صور أمهاتنا
واحلام الصبايا !
نحن!!
نحن ما زلنا في هذه المدن البائسة أسعد الناس .
نزين شوارعها بضحكاتنا
نشرب نخب من نحب طول المدى
ونسكر من فوح الذكريات
نقية قلوبنا
تسعدنا تحية من عابر سبيل
ولفتة من فتاة مشغولة في شرفة
لا نحمل الساعات في يدنا
لتبقى لحظات الفرح معلقة
مثل أيقونة في المعبد
كتابا مقدسا
أو ندبة غدر لا تمحى ....

2

أيها الأصدقاء
يا من مضيتم تباعا
مضيتم تباعا
وتركتم الحرب خلفكم
نشاطر تجلياتها الثقيلة
أيها الأصدقاء
تباعا تركتم القصيدة خائفة بين يدين مكلومين
اللوحة غامضة جدا
وقد انهكني البحث عن معنى
لما يدور في الافق
أيها الاصدقاء عذرا :
من كان يقرع طبول الحرب
غادر !!
من كان يعشق شعارات الغد
غادر!!
من كان يعشق الحرية
غادر!!
وحدي...
وحدنا نتسائل
من يقرع أجراسك
ايتها الحرب. ...؟؟؟؟

3

بلادي
ما يزال
السيئون
الحاسدون
يحاولون منعي
من الوصول إليك
ويجهلون حقيقة
كوننا متحدين كتوأمين سياميين
لا يقوى أحدنا على الغدر بالآخر
............
ثمة ذاكرة للدروب الريفية
كجمرة غافية
ما أن تهب عليها نسائم الحنين
حتى تدر لك بكل براءة الطفولة
وسط ذهول
الحقول المجاورة
..........
وانت...
كل المسافات لم تبعدك عني
امنح روحك الحرية
اتركها على سجيتها
عش كنبي
لزمن قادم ....



توزع مجـــــــــاناً

# Xelkên Serê Kanîyê..

## Raborîyeka Tijî Şer û Ayindeyeka Nepenî



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٦٨)   ٢٠١٩/١١/١ م